- Ev agahiya fermî li ser Coronavîrus ji we re tê pêşkêş kirin ji aliyê kantona Fribourg'ê.
- Rayedar ji we dixwazin kû heya ji we tê, win li malên xwe bi mînin û dûr bikevin ji têkiliyên civatî ji bo kû belavkirina vîrus kêm bibe.
- Pêwîste kû her kes van rêzikên rayedaran bişopînin ji bo kû vîrus were sekinandin û ji bo kû nexweşxane bi karibin nexweşan baş bikin. Ev rêzik we û mirovên we di parêzin ji vî vîrusî.
- Heger win nexweş bin, li mala xwe bimînin û ji her kesî dûr bikevin.
- Heger win dikuxin û laşê we germ dibe, bi telefonê, bi kevin têkilyê bi doxtorê xwe re. Şîretên doxtorê xwe bi cih bînin.
- Heger rewşa we ya tendiristî girantir bibe (wekî: heger win nema baş dikarin nefes bidin û bistînin) telefona doxtorê xwe bikin û şîretên wî bi cih bînin.
- Ji bo hemû pirsên bi tendiristiyê ve girêdayî û heger win hizir dikin kû win nexweşin, pêwîste kû win li ser xeta taybet ya kantonê bi axivin : 084 026 1700 (2 caran dûbare bikin)
- Rayedar ji we dixwazin kû win ji malên xwe ne derkevin heger pêwîstiyek tûnne be.
- Heger win ji malên xwe derkevin, gereke win xwe dûr bikin ji mirovan û ji cihên kû pirr kes lê hene.
- Pêwîste kû mesafa 2 metran win xwe dûrî kesên din bikin. Her seatekê û dema kû win vedigerin malê destên xwe bişon.

- Ji mala xwe tenê ji bo sedemên gîrîng derkevin, mîna ji bo : hacetên kirîna xiradan ji dikkanan.
- Xwe dûrî gîşeyan, vegûhestinê gelemperî û stasyonên trênan bikin.
- Ji bo xwarinê, di despêkê de, xiradên kû li mal hene bi kar bînin. Plana xwarinên xwe yê heftekê amade bikin û tenê yek kes bila herê wan xwarinan bikrê. Heya kû ji we tê, di dema kû kêm kes li dikkanan hene, herin xwarinên xwe bikrin.
- Ji bo parastina êxtiyaran an jî yên kû pirsgirêkên xwe yên tendiristî hene, xwarinên wan bikrin û deynin pêşiya derîyên wan.
- Serdana kesên êxtiyar anjî yên nexweş nekin. Tenê bi telefonê bi wan re têkiliyê çêkin.
- Hemû çalakiyên di civatan de (dibîstan, xwaringeh, werzişî, çandî) tên sekinandin.
- Ev tê wateya kû pêwîste kesek tevlî şahiyan nebe (mîna şahiyên rojbûnê an jî yên ser salê)
- Ji bo mijûlbûnê, giranî bidin çalakiyên li mal û tenê bi neferên ji malbatê re.
- Ji bo zarokan, gereke win telimatên dibîstanê bişopînin.
- Bi zarokan re bi lîzin, mîna bi leystikên civakî, resim, çêkirina xwarinê.
- Pêwîste kû win çarekê bibînin ji bo kû zarok li mal bimînin. Heger pêwîstiyek hebe, win dikarin zarokên xwe ligel cîranên xwe anjî nasên xwe bihêlin, lê ne ligel kesên nexweş û ne ligel kesên êxtiyar.

- Heya kû qedexe tûnne be li ser derketina derve, win dikarin derkevin cihên mîna li daristanan bi meşin, lê bi tena xwe.

- Dûrkevin ji parkan, ji grubên zarokan û ji ketina têkiliyên bi malbatên din re.

- Em sipasiya we dikin ji bo pêkanîna we van rêzikan. Wisa winê xwe, nasên xwe û hemû xelkê din bi parêzin. Ji bo pirsên we, win dikarin li ser vê xeta taybet ya kantonê bi me re bi axivin: 084 026 1700 (2 caran dûbare bikin). Tenê li ser vê xeta telefonê win dikarin agahiyên fermî bi dest bixin.

- Rêxistina ORS û ya Caritas Suisse-şaxê Fribourg, wê bersiv bidin pirs û fikarên we.